# KURDISTANA XOŞEWÎST RE

**Mahmûd Nejâd**

**Ji Osmanî: Kenanê Nado**

*Ax, welat! Ey qada xemê, kişverê ji xwînê tijî*
*Ey dayika kederbar a zaroka xwe windakirî!*

*Mişextkirina ji te dike min efsûnî ey gora kalikê min*
*Çi qas tu bê bilêvkirin tesellî dibe ruhê min*

*Tekamulê dide îmanê hezkirina heqê*
*Emrê abadî ye raxistina li rêya te canê*

*Heya ku li serê çiyayê te yê berfîn, tav bibe roşan*
*Dê çi xweş biçilwile wek almastê serwet û saman*

*Min bayê xemê bi roniya xeyalê te bihurand*
*Digerim vê gavê roniya te, dîcevrî min qedand*

*Ax! Her ber bi te hatin ber bi te revîn bû xeyalê'm*
*Lêbelê zivistanê min girêda, tuneye êdî halê'm*

*Ger di hîcranê de bimirim, bila laşê min ji çiyayan re bimîne*
*Da ku bi her bayê şam û seherê bêhna welêt hilîne*

*Berxikên xwe xwestiye te, hemû jî hazir*
*Dê kî bişîne wan, jixwe qet napirse nazir*

*Ew tenê bi yek neqaretekê qebqeb dikin*
*Ji bo koçreviyê tekbîran, zahirî ji bîr dikin*

*Lê berxwedana ewladên te sebatkar e*
*Îstîqbala her cehddar û vîndarê rastbar e*

*Tazî û peyatî ber bi te ve dimeşin*
*Ji çiya û berfê jî exlebî vedigerin*

*Vekişe ji rê, ey berfa ku zû dihele bi axê*
*Tu jî hilweşe ey bahoz! Tu bibe evîndar ey tav*

*Ax dayê, dayika rindik! Bêje van zarokan*
*Dê hê bidome wiha ev hîcran*